

## Ji rengên welatparêziyê, xeberdana Kurdî

Mihemed ELÎ

[efrin2612@hotmail.com](mailto:efrin2612@hotmail.com)

Welatparêzî, gotinek çendî xweş e ku mirov bibihîse û wateyek çiqas fireh e ku mirov pê sexbêr bibe û kela kovanên vê çarenûsa bêbext birijîne! Ji destpêka dîrokê ve, ev gotin bi hemî heyîna xwe di nav civakên mirovantiyê de xwe bi teşeyên cihêreng raber dike. Reng e ev welatparêzî di wargehên lawiran de jî hebe, lê mixabin ewqas haya me ji hestên lawiran nîn e, ku em bizanibin ka welatparêziya wan ta çi astê ye, tevî ku girîng e mirov bizanîbûya, çimkî hingê mirov ê helwesta lawiran bermaberî ya kurên(adem) bikira û boçûna rast a (wan) ji welatparêziyê nas bikira.



Gelo welatparêzî ji çi bingehê tê, kurên(adem) çima dibin welatparêz? Ma ew tiştêkî zikmakî ye, perwerde, fêr, nêrît lê berjewendî ye...?

Ev pirsên ku em li jor ji xwe û ji we dikim ji wê rastiyê tîn, ku her hêmanek di ketwarî(pratîkê) de jixwe heye. Hin kes welatparêz in ji ber ku welatparêz in û hew, hin kes welatparêz in ji ber ku wisa hatine perwerdekirin, hin kes jî bi fêr û nêrîtên xwe welatparêz in, lê tiştê herî balkêş ew e, ku mirov ji bo berjewendiya xwe bibe welat(parêz)!

Çawa ku bingehên cihêreng ên welatparêziyê hene, her wisa şeweyên ciyawaz ên welatparêziyê jî hene. Hin bi canê xwe welatparêz in, hin kes bi diravên xwe welatparêz in û hin kes jî bi reftarên xwe parêz in... lê mixabin hin kes ji bo diravên xwe jî welat(parêz) in. Jixwe em çêra wan nakin çimkî dabaşa me welatparêzî, ne welat...(parêzî) ye.

Carekê em ji kalemêrekî Kurd pirsîn ku bêje welatparêzî çi ye? Bersiva wî bi asanî ew bû ku welatparêzî namûs e! Tevî ku camêr ji bilî wê gotinê nekir, lê paşê em serwest bûn ka çi mebesta wî ji vê gotinê hebû, nemaze çaxa ku me bikaranîna vê gotinê (namûs) beramberî bikaranîna wê ya dema, wek ku hunermendê Efrînê, Eliyê kapê, gotiye 'Kurdên Rast' kir.

Berê, dema ku mirov ji yekî tijî dibû (ditengijî), ango digihîşt asta herî bilind ji bêhtengbûnê, îcar di ber xwe de digot 'filan bênamûs e'. Mixabin îro gotina 'bênamûs' bûye benîştê devê her kesî û gotina bêhnvedan û henekan e! Gelo hingê mirovan bi zanebûn li dawîya dawî ji yekî re digot 'bênamûs' û hew? Heke wisa be, gotina welatparêzî jî bi hemû wateya xwe heman tişt e.

Welatparêzî jî mixabin îro li def pir kesan bûye gotina henek û niyazên qirêj. Lê divê em ji bîr nekin ku tarî nikare tu caran zora ronahiyê jî bibe, ji ber ku çiqas reşî hebe, bêtir ronahî jî

heye, ango çiqas kesên ku gedên civakê dixin berjewendiya xwe, li raber wan kesên ku ji dil û can ji bo civaka xwe dixebitin jî hene!

Ji rengên cihê yên welatparêziyê, em dixwazin li ser kulîlek ji kulîlkên ronahiya welatê rojê rawestin û mînakek rast û rasteqîn ji mînakên welatparêyiza bêdeng û jixwebawer araste bikin. Ji ber ku bakurê welêt hertim rojev û gorepana gengeşiyên berfireh e, me jî berê xwe da wir û mînaka xwe ji wir veguhast.

Girîfta Kurdî li bakurê kurdistanê ji her kesî re pen û diyar e, dewleta Tirk bi hemû alavên hovane armanca jiholêrakirina zimanê Kurdî ji xwe re kiriye kar. Tevî ku pir kesên Kurd ketine ber dava vê siyaseta qirêj jî, lê di heman demê de pir zîl û şaxên wêrek jî xwe ji bahoza bêbextiya vê ramyarê re netewandine, wan berevajî pir Kurdên ku bi navê Kurdî çûne Ewropa û bi angaştê ji ber 'xwedîderketinê' li Kurdî ew bêgavî terka welêt bûne, mafê penaberiye li Ewropa sitandine, lê mixabin, nikarîne xwe ji kirasê xinizî, nezanî û xwebiçûkdîtîne derxînin. Ew demildest bûne koleyên ramyariya Tirkan, piştê jî bûne beniyên diravan, ku pir caran ji ber wan jî angaştê welat(parêziyê) kirine. Ev kes îro ji Tirkan bêtir ji zimanê Tirkî hez dikin û bêşermî zînat û neheqiyê li zimanê xwe – Kurdî- dikin. Çendî rewşa wan û welatparêziya wan mîmanî 'bênamûsiya' amaje li jor pê hatiye kirin e!

Li hember van kiryarên bêşerm û bêçemek(bêmantîq) gelo mirov ê xwedîderketina malbatek Kurd, ku hema bêje hemû zarokên wê li Ewropa hatine dinyayê û di nav çandek biyan de mezin bûne, lê di heman demê de Kurdiya ku ew pê daxivin helbestên Ehmedê Xanî, Meleyê Cizîrî û dengbêjên welêt tînin ber çav û guhên mirov, çawa binirxîne? Gelo ev ne renegekî xweş û gezo ji rengên welatparêziyê ye?

Sertaca vê malbatê dîlana gotinên Kurdî, keçika wan Dîlana zarok e, ku bi temenê xwe tenê neh salî ye! Dîlan li Almaniya hatiye cîhanê û heya pênc saliya xwe li wir maye, lê mixabin ji ber ku malbata wê nikarîbûye mafê penaberiye li Almaniya bistîne, dugela Alman ew vegerandine Tirkîyê. Ew sê sal û nîvan li Sitembolê mane... Dema mirov li Kurdiya ku Dîlan pê xeber dide guhdarî bike, mirov hew bawer dike ku ev kulîlk li Almaniya hatiye cîhanê û pênc salan li wir maye û dora çaran li Tirkîyê çûye dibistana Tirkî. Bi nawayên dengê Dîlanê re, bi xwendina Dîlanê wek tûtiyekî li ser dara sicê, mirov dibêje qey ew guhdarî şagirtekî Ehmedê Xanî dike, an jî mirov li nav zozanên Kurdistanê ye û guhdarî destaneke Kurdî ji devê evdalê Zeynikê, Kawîs Axa an jî Bavê Selah dike...!

Yekemîn car pêjna gotinên Dîlanê hatin me, vê diyardeya li gorî pir Kurdên derûnlawaz û nezan, tiştêkî bêgane ye, bala me kişand û me xwest em rîçal û rehên vê diyardeyê vekolin ka belkî ji pir welat(parêzan) re bibe ders û wane. Vêca me xwest em li raza vî rengê welatpariyê bigerin û binasin...

Me silev (di destpêkê de) bi malbata wê re û paşê jî bi Dîlanê re çavpêketinek kurt û kurmancî çêkir û me bizav kir, ku em raza vê diyardeya awarte binasin.

**Pirs ji malbata Dîlanê:**

**P: Roj baş.**

- roj baş.

**P: Hûn dixwazin em di destpêkê de pirsê ji kê bikin?**

- Dayîka Dîlanê piştî ku hevserê wê rê didiyê, dest bi axaftinê dike. Lêmanên heyecanê di dêmên wan de diyar in!

**P: Hûn wek mirovine Kurd xwe çawa dibînin?**

- Ez pir bi zimanê dayîka xwe serbilind im, ez bi hemû reng û hêza xwe girêdayî kultura xwe me... ez kêfxweş im...

Bavê Dîlanê jî wisa bersivê dide: Ez gelekî kêfxweş im, Hevalê M. E. bihêle ez bibêjim, îro ji mafê me Kurdan e ku em jî wek hemû milletên cîhanê xwedî axatî û serfiraziyê bin, wek Fransiyayê, Elmanan, Ereban... Kurdayetî nasnameya me li vê dinyayê ye...



**P: We çima wek piraniya malbatên kurdan bi zarokên xwe re bi Tirkî xeber nedaye?**

- Herdu dikenin. Bi rastî em tu caran nefikirîne ku kesek ê vê pirsê ji me bike! Gelo kes ji çivîkan re dibêje hûn çima bi zimanê xwe dixwînin!? Em bi zarokên xwe re bi Kurdî xeber didin ji ber ku em kurd in û hew. Ji xwe tu Kurd bî û tu bi zarokên xwe re bi zimanekî din xeber bidî, ev yek şerma herî mezin e ku mirov rojekê bi ser xwe de bîne.

**P: Bi dîtina we, sedema ku pir malbatên kurd, çî li Ewropa û çî li welêt bi zarokên xwe re bi Tirkî daxivin çî ne?**

- Kesereke kûr dikişînin. Ez nizamim çî bêjim, lê tiştêkî pir şaş û çewt e. Tu dizanî piraniya kesên bi zarokên xwe re bi Tirkî xeber didin an jî wan bêgav dikin ku bi Tirkî baxivin, ew bi xwe çar gotinan bi Tirkî nizanin! Digel vê yakê bi wan re bi Tirkî xeber didin. Ew ji xwe fedî dikin, a rast ji zimanê Kurdî fedî dikin, Ecêba xwedê ye! Divê mirov hinekî bi xwe re bisekine û hay ji parçeyên kezeba xwe, ji zarokên xwe hebe. Heke mirov bi zimanekî din bizanibe tiştêkî pir baş e, zanîna zimanekî zanîna çandekê ye, lê ev nayê wê wateyê ku mirov dev ji zimanê dayîka xwe berde. Zimanê yekemîn zimanê dayîkê ye, paşê zimanê din tê.

**P: Hûn tu caran hîs dikin tiştêkî zarokên we kêm e ji ber ku ew baş bi Tirkî nizanin?**

- Berevajî, heke bi Kurdî nizanibin hingê şerm û kêmasî ye, bila paşê bi Tirkî jî bizanibin. Hevalê M.E. Tu dizanî em ji zû de li Ewropa ne, hin caran em gelekî acêz dibin ku hinek gotinên Kurdî hene me ji bîr kirine. Dîsa em serbilind û kêfxweş in ku zarokên me li Almaniya bûne û mezin bûne, lê ew zimanê bav û kalan baş dizanin...

Em ne li dijî zimanê Tirkî ne, heya li vir min xwest zarokên min Tirkî jî bizanibin, lê çaxa min ew şandin dibistana zimanê Tirkî, bêhna wan pir teng bû. Piştî çend rojan hatin ji min re gotin, ku hertim li dibistanê heqaret li Kurdan dibe û navê gelê Tirkî û Atatürk ji ser zimanê wan danakeve! Em dixwazin zarokên me xwe bi hemû zimanan derbibirin û îfade bikin.

**P: Bi baweriya we, mirov ta çî ast û dereceyê neqencî û zînatê dike dema ku bi zarokên xwe re bi zimanê dayîkê xeber nade?**

- Însanê wisa dike pir şaş e. Ew xizmeta herî mezin ji dijmin re dike û zirara mezintir bi rûmet û zimanê dayîka xwe dike. Hewceya mirov bi her zimanekî heye, lê Kurdî di rêza yekemîn de ye. Dijmin hemû rengên sitemkarî û kirêtiyê bi serê Kurdan kirine, xeberdana me jî bi zimanê wî sipasdarî ji van kiryarên qirêj re ye! Bawer bike, heke em ji laşeyê xwe derkevin jî, Tirk tu caran me napejirînin. Em derewan li dilê xwe bikin û xwe bikin Tirk jî xwîna me û wan wek zeyt û avê ye tu caran têvel nabe, heke goştê me di cirnekî de were kutandin, goştê me dê xwe ji goştê wan bide aliyekî...

**P: Bo neheqî nebe, gelo ma hemû Tirk wisa ne?**

- Na. Ne hemû, lê piraniya wan! Ew çiqas xwe baş bidin derpêşkirin jî, heke mijar were ser kurdayetiyê, hemû dibin mar û ajdeha. Ez dikarim ji ezmûneka kesane mînakekê bidim. Hemû kes bi nêrîn û dirûşmên çepên Tirkan dizanin, ez yek ji wan kesan im, ku min bawerî bi nêrînen wan kir, lê îro ez dihizirim çendî em dihatin xapandin. Heman tişt îro xwe di AKP de dubare dike, Kurdên ku îro bi angaşten AKP tên xapandin, piştî çend salan ew jî dê wek min bêjin çî derew bûn ew dirûşim û angaş... Nêrîna fermî ya Tirkan li dijî Kurdan heman nêrîn e, çî rast û çî çep. Ez dixwazim bêjim, rêz û hûmeta me ji Tirkên ku xwe dispêrin çemkên mirovantiya rast re bêsînor e.

**Dîlan....**

**P: Gava ku tu bi kurdî xeber didî, tu çawa dihizirî?**

- Kêfa min gelekî tê ji ber ku ez Kurd im. Ez kêfxweş dibin ji ber ku zimanê dayîka min e. Ez tu caran tengasiyan nakêşim, ez dihizirim gotin jixweser ji devê min dedikevin... çaxa yek tişteki bi Kurdî ji min re xeber dide ez zû fem dikim û nema ji bîr dikim.



**P: Tu dikarî bi Kurdî lê bi Tirkî baş binivîsî?**

- Bi Tirkî ji ber ku ez çûme dibistana Tirkî. Lê tevî ku Kurdî li dibistanê nîn e, ez dikarim her wisa bi kurdî jî binivîsim, çimkî ez dixwazim tiştên dayîka min ji min re dibêje binivîsînim...

**P: Tu li dibistanê bi Kurdî xeber didî?**

- Na. Egere ez li wir bi Kurdî xeber bidim, ew ê bavê min têxin hebsê. Lê ez tim li dibistanê di dilê xwe de bi Kurdî xeber didim, çaxa ku em merşa Tirkî dixwînin ez di dilê xwe de tercumanî Kurdî dikim!

**P: Gelo ne zehmet e ku tu Kurdî, Tirkî û Almanî dizanî, hin caran tu hîs nakî heşê te tevî hev dibe?**

- Na, eger ez tişteki bi zimanekî nizanibim û bi zimanê din bizanibim, ez wî tiştî zû nas dikim!

**P: Çawa min fêr nekir!?**

- Mesele, tiştên dibistanê, min ewil bi Almanî nas kirin û paşê bi Kurdî û Tirkî zanîn. Min navê wan bi Kurdî û Tirkî zû ji ber kir çimkî ez wan berê bi Almanî nas dikim...

**P: Ji van hersê zimanan, tu ji kîjanî pir hez dikî?**

- Ez pir ji Kurdî û Almanî hez dikim, ez naxwazim bi Tirkî xeber bidim. Ez ji Tirkan û zimanê wan hez nakim, ji ber ku ew hertim li Kurdan didin...

**P: Tu dixwazî biçî dibistana Kurdî?**

- Erê, ez dixwazim baş fêrî Kurdî bibim bo ez bikaribim kîtabên Kurdî bixwînim...

**-Sipas ji te re Dîlan. Sipas ji malbata te re**

- Ser çavan...

**3.8.2008**

**BERN. Switzerland**